

Pirsên Gelekê Caran Tê Kirin

Jimartina xwandinkaran (Student Census) çi ye?

Em hemû tên jimartin: HWDSB Student Census, rapirsiyeke xwandinkaran a bi dilxwazî û veşartî ye ku ji bo xuyandin a rawestîna astengiyên li ser nasnameyên xwandinkaran (nîjad, regez filan) pirsan dipirse.

Ew li çi dipirse?

Li gora temenê xwandinkarî, pirsên jimartina nifûsê dibin li ser zimanên xwandinkarî, nasnameya wî ya Herêmî, koka nîjadî, nîjad, dîn, nasnameya cinsî, meyla cinsî (ne)karîn, cîhê jidayîkbûnê û rewşa welatîbûnê/koçberîyê dibin bên pirsîn.

Meyla me bi standardên daneyên li dijî nîjadperestîyê yên bi navgînîya Qanûnê li dijî Nîjadperestîyê yê bi mebesta xuyandin û rawestîna li ser newekhevîyên encamên biserketinan û keysên xwandinkaran re lihevhatî ye. Ji bo dîtina formê jimartinê ji kerema xwe herin sardana vê navnîşanê: www.hwdsb.on.ca/weallcount.

HWDSB ji ber çi nifûsa xwandinkaran dijimêre?

Gelek ji encûmenên birêvebirîya xwandingehan xwandinkar jimartin. A rastî li gora [Qanûnê li Dijî Nîjadperestîyê, 2017](http://hwdsb.info/36SHsul) (hwdsb.info/36SHsul) û [Pîlana Bizava Wekhevîya Hînkariyê yê Ontaryoyê](http://hwdsb.info/2Lwie2) (hwdsb.info/2Lwie2) encûmenên xwandingehan divên van daneyan berhev bikin û bidin zanîn. Encûmena Mafên Mirovan a Ontaryoyê (OHRC) ji bo alîkarîya bi xuyandina valahiyên di xizmeta dezgehê de, dîtiye ku berhevkirina daneyan dibe di avakirina stratejiyên xurt ên mafên mirovan de roleke xwe ya girin dibe hebe.

Li HWDSB-ê, jimartin yek ji procektên me yê [Pîlanê Bizava Wekhevîyê](http://hwdsb.info/equityplan) (hwdsb.info/equityplan) ye. Dê dane alî me bikin em pêdivîyên xwandinkaran û malbatan fehm bikin, astengiyên sîstemê bidin xuyandin û li ser wan rawestîna û em biryarên li ser îsbata encamên adiltir pêk bînin bidin.

Ew ê çawa pêk bê?

Hînbûyîyên rû bi rû– Ji zarokxaneyê heta Sinifa 4an: Her xwandinkar dê tevî vê nameyê nisxeyeke çapkirî ya vê forma jimartina nifûsê bibe malê. Dê dêûbav li ser navê zarokên xwe formê bijartina nifûsê tije bikin û kaxezê formê jimartina nifûsê li xwandingehê vegerînin. Eger li ser tore tijekirina forma jimartinê bibijêrin, dikarin girêdanka ewle ya peydekirî jî bi kar bînin. Ji

kerema xwe serê her xwandinkarî bi tenê yek formeke jimartina nifûsê tije bikin (li ser torê yan çapkirî).

Hînbûyîyên ji dûr ve – Ji zarokxaneyê heta Sinifa 4an: Em ê girêdankeke ewle ya forma jimartina nifûsê bi posteya elektronîk ji malbatan re bişînin, ew dikarin bi vî awayî li ser navê zarokê xwe formê jimartinê li ser torê dagirin. Nisxeyên çapkirî eger bîna xwastin dibin ji mamhosteyên zarokên xwe bîna peyderkirin. Ji kerema xwe serê her zarokê bi tenê formetek jimartina nifûsê dagirin (li ser tore yan çapkirî).

Hînbûyîyên rû bi rû û ji dûr ve – Sinifên 5 ta 12: Em ê girêdankeke veşartî ji xwandinkarên ji sinifa 5an heta 12an re bi nameya elektronîk bişînin, ta ew karibin bi desteka mamhostayî gava zemanê sinifê karibin forma li ser torê ya jimartinê temam bikin. Nisxeyên çapkirî dibin bi xwastina ji mamhostayê xwandinkarî bîna peyderkirin. Ji kerema xwe serê xwandinkarekî bi tenê formeke jimartinê temam bikin (li ser tore yan çapkirî).

Dane çawa bi kar tên

Em ê daneyan ji bo serwestbûna avahîya nifûsa xwandinkaran a HWDSB-ê û ji bo berhevanîna raportên li ser tevlihbûyîna bernamêkirinê û keysan û biserketinan bi kar bînin. Em ê meylan û valahîyan bidin xuyandî û bibînin kîjan kom di kîjan rewşan de bêtir û kêmtir temsîlîkin. HWDSB, dê vê nirxandina meylê ji bo rakirina pêkanînan cudakariyê û mebesta rakirina astengiyên li ber biserketina xwandinkarî bi kar bîne. Em ê bi raya giştî bidin zanîn ka ev encamên jimartina nifûsê û ev dane çawa alî rêbertîya bernamêyên HWDSBê, stratejiyên wî, siyasetên wê, pêkanînan wê, jêderên wê û destekên wê kirine.

Dê HWDSB zanyariyên kesîn ên xwandinkaran çawa biparêze?

HWDSB, gava zanyariyên li ser xwandinkaran û malbatan berhev dike, sozê tenga herî bilind a veşarîbûnê û dizîbûnê dide. Zanyariya jimartina xwandinkaran di binê deshilata Qanûnê Dijî Nîjadperestîyê, 2017, S.O. 2017, c. 15, Qanûnê Hînkariyê, R.S.O. 1990, c. E.2 de ye, û bi Qanûnê Parastina Veşarîbûnê û Serbestîya Bidestxistina Zanyariyan a Belediyeyan, R.S.O. 1990, c. M.56 re lihevhatî ye.

Jimartina xwandinkaran bi dizî ye lê bi tevahî nîne. Bersivên kesîn ên xwandinkaran dê bi awayê ku hîç zanyariyeke kesîn a tu xwandinkarî tu car nikaribe bê binavkirin, ji bo nirxandinê bi hev re bê dabeşkirin. Bersivên berhevkerî dê di zemîneke daneyan a veşartî û ewle de bê veşartin û ji bo xuyandî û kinkirina meylên di nava xwandinkarên HWDSB-ê de, bi tenê rêncberên HWDSB-ê yên Lêkolîn û Nirxandinê xwe bigihînin wan.

Gelo ev mecbûrî ye?

Temamkirina jimartinê bi dilxwazîyê ye. Lê em dixwazin xwandinkar tevî bibê, em bi vî awayî dîtineke rast a nifûsa xwandinkarê xwe bi dest dixin. Tenga bilind a bersivan dê alî me bike em astengîyan bixuyînin, stratejîyan ava bikin û bêtir alî me dike em li ser astengîyên li ber biserketin û dilxweşîya xwandinkaran biryarên zanatir bidin. Malbatên ku naxwazin zarokên wan tevî bibinê dikarin formeteke li ser Portala Dêûbavan dagirin û dev jê berdin.

Jimartina xwandinkaran HWDSB çawa hat bipêşxistin?

Pirsên jimartina xwandinkaran a HWDSB-ê, bi pirsên nimûne yên Standardê Daneyan a li Dijî Nîjadperestîyê yên Qanûnê li Dijî Nîjadperestîyê re lihevhatî ye. Ev pirs ji bo xuyandina newekhevîyên encamên biserketin û keysên xwandinkaran û rawestîna li ser wan tên bikaranîn. Bi awayekî herêmî, jimartina nifûsê bi têketîyên giring ên ji cûrbicûr ên ji xwandinkaran, malbatan, rêncberan û endamên koman hatî, hat berîdayîn. Ji bo em danzanînên bersivê kom bikin me şîretkarî li dar xistin û me ji bo pîlankirina jimartina xwandinkaran, bipêşvebirina wan, nîrxandina wan û pêkanîna encaman da dû sepanên herî baş.

Ez ê kingê encaman bibînim?

Piştî ku di Nîsana 2021ê de jimartin hat kirin, dê rêncberê Lêkolîn û Nirxandinê daneyan binirxîne û dê di çîrîya paşîn a 2021ê de wan bi raya tevahî bide zanîn. Dê HWDSB biryarên ji daneyên jimartina xwandinkaran berhevkişî bi xwandinkaran û malbatan bide zanîn.

Serjimarî ji bo xwendekarên xwedî pêwîstîyên perwerdeya taybet heye?

Belê. Li gorî hewcedarîyên xwendekaran, em ê bicîhbûna pêwîst wekî teknolojiya piştevan û alîkar dabîn bikin da ku her xwendekarek bikare beşdar bibe. Personelên piştgirîyê yên wekî alîkarên perwerdeyê jî dê li gorî pêwîstîyê piştgirîyê bidin. Em ê bibin alîkarî da ku malbat bikarin serjimarîyê li ser navê wan xwendekaran bi dawî bikin ku pêwîstîyên wan ên taybet ên perwerdeyê nahêlin ku anketê bi tena serê xwe çêkin.

Serjimarî ji bilî îngilîzî bi zimanên din jî heye?

Belê, serjimarî bi fransî heye û 10 zimanên herî zêde ku di HWDSBê de hatine ragihandin: erebî, çînî, farsî, karenî, kurdî, koreyî, somalî, spanî, urdûyî û vietnamî. Ji pêşdibistanê heta pola 4an malbatên ku zarokên wan di van polan de hene û kesên ku bi van zimanan xwendewarîya wan a sînordar heye û di polên 5 heta 12an de cih digirin, ji bo wan xwendina dengî heye. Ji bo zimanên din jî malbat, xebatkar û/yan jî perwerdekarên SWISê bi rêya emaila census@hwdsb.on.ca dikarin daxwaza wergêr bikin yan jî têkilîyê bi dibistanê re daynin.



Çi pirs?

Gava em xwe ji bo jimartina nifûsê kar dîkin em gazî dîkin û bersiva pirsan didin. Ji kerema xwe bêtirî wê ji sîteya me ya înternetê fêr bibe; www.hwdsb.on.ca/weallcount, li ser jimartina nifûsê çî pirs bên meraqkirin hûn ê Pirsên Gelekê Caran tên Kirin (FAQs) karibin li vê derê bibînin. Hûn herweha dikarin bi komxebata me ya jimartina xwandinkaran re jî ji vê derê têkilî bikin; census@hwdsb.on.ca.